de peyva martî wê wateyê dide. Anku Kurd jî tiştên mîna kêrê re dibêjin kêr mîr û jî tiştên mîna diwar re dibêjin miwar û herwisa. Îca ev partiyên ku îro li Rojavayê Kurdistanê weku partî tene naskirin, ew bi rastî partî ne, yan jî tiştin mîna partiyên e, bi gotineke din, gelo ev partî ne yan martî ne? Eger partî bin, li welatekî mîna Elmanyayê ku hejmara xelkên wê heystê û du milyon derbas dîke tenê pênc an jî şeş partî li seranserê welêt hene û li Rojava ku hejmara xelkên Kurd çar milyon derbas nake çawa zêdeyî sîh û sê partiyên dikarin hebin. Her çendî em sedeman zanibin, dîsa jî ne ji bo beramberkirinê, lê ji bo bibixistinê em vî minakê didin. Wekî din giringtirîn pîrs di vî çarçovê de pîrsa danasîna partiyê ye. Gelo partî çî ye? Di bersiva vî pîrsê de, wê zelalî jî bê holê. Lê ji ber ku bersivê amade û danasîneke weha destnîşankirî li ber destên

me nîne û ji bo em nekevin nav gerîneka danasînen teyoriyê, em rasterast behsa cudayîyan bikin. Li Elmanyayê li cem van pênc partiyên mirov li pênc rêbaz û nerînen cihêreng û di her warî de, rast tê. Weku minak her partiyek xwedî pirojeyên taybete yê di derbarê siyaseta civakî, ya aborî, ya leşkerî, ya çandî, ya perwerdê, ya birêveberiyê, ya bacê û ya li hember xerîban... û ya... û ya siyasî û herwisa. Dema em berê xwe bidin partiyên Kurd û li pirojeyên wan binerin, mirov digihêje encameke din. Partiya Kurdî li Rojava ne di warê civakî, ne jî aborî, ne jî di warê perwerdê de, ne jî di qada çand û hunerê de, ne jî di ti warên din de, xwedî piroje ye. Tenê - qenc xerab - xwedî pirojeyekê siyasî ye û vî dawiyê jî pêdivî bi aliyê leşkerî çêbû. Di dema destpêkê de perçebûnê xwe dispirtê têgehên çep û rast û bêalî û dûre jî xwe sipart nêzîkbûn û dûrbûna ji marksîzîm û Lénînzîzmê û vî

dawiyê jî xwe dispêre palîştî partiyên mezin yê Bakur û Başûr. Balkêş e ku zêdeyî pêncî salî di ser karê siyasî yê van partiyên re derbas bûye, lê heta niha jî yek partî bi awayekî wisa zelal û vekirî nebûye xwedî pirojeyekî çandî yan jî zimanî û li vî pêdiviya Kurdan ya lezgin xwedî derkeve, tev li silogonên neteweyî yê her partiyê ku dixwaze xwe ji ya din şayitir bike. Bi vî awayî hetanî ku rêxistînek nebe xwedî pirojeyên berfireh ku hemû qadên jiyana miletekî bidin ber xwe, ew nikare bibêje ku ew partî ye. Tuncbûna ramanên cihê li cem partiyekê pîrsa hebûna wê partiyê tîne holê. Çi pêdivî bi partiyekê bê piroje yan jî bê imkanên pêkanîna pirojeyan, heye? Çi pêdivî bi partiyekê heye ku ew bixwe mîna partiyekê dine û nakokî tenê di helwesta li hember kesekî yan jî aliyekî de ye? Ev nivîs ne ji bo biçûkxistina ti partiyekê Kurd hatiye

nivîsandin. Lê di heman demê de ew balkişandineke ber bi nenormalbûna rewşa partiyên ku li şûna bi pirojeyên xwe Rojavayê Kurdistanê bi pêş ve bibin, ew dibin bar û mîna keleman di pêşya her pirojeyekî pêxistinê de xwe didin pêş. Herweha balkişandineke ber bi xalên hevbeş ve ye, yê ku kêm zêde li cem hemû partiyên hene. Îca kîjan partî jî yê Rojavayê Kurdistanê bi rastî partî ye û dikare di vî qonaxa dîrokî de bibe xwedî rol û kîjan jî tenê navê partiyê li sere û destekî pûç e di pêvajoya cihbîçîkirina pirojeyên cihê de? Bersiva vî pîrsê di du qadên cuda de xwe eşkere dîke, yek jê hebûna pirojeyan e û ya din pêkanîna wan a li ser erdê ye. Beşekî mezin jî van partiyên jî van herdu qadan bêpar in, lê dîsa jî wekî partî tene binavkirin. Çare çî ye? Divê bersiva vî pîrsê jî dezgeh û aliyên li Rojavayê Kurdistanê xwedî rol in bê dan.



pêwîstî bi binxistina şaristaniya Rojhilata Navîn heye". Ji bo pêkanîna vî armancê misyon dane hêzên Îslamî, ku ew bi xwe pêkhatyek bîngehî yê Rojhilata Navîn e, lê hêzên Rojavayî û di piştî wan de aqilmendên Mason yê navnetewî pir baş fayde ji naveroka Îslamê ya hişk û sert dikin

Sultan Temo

Hêzên navnetewî yê komploger bi daxwaza perçekirina Rojhilata Navîn, hemû cûre listikên xwe pêş dixin. Di serdema Sed sala nû de bîryar dane ku hevpeymanan «Sykes Biko» bi dawî binin, êdî Rojhilata Navîn jî nû ve perçe bikin. Ev rêjîmên desthilatdar yê ku weke encama wê hevpeymanê derketine navê nikarin jî bercewendiyên hêzên navnetewî re bibin bersiv. Di dirêjahiya dîroka nûjen de gelek caran hêzên sermayedar yê Rojavayî destwerdana Rojhilata Navîn kirine jî bo pêkanîna bercewendiyên xwe, lê gelê Rojhilata Navîn baş tê negihîştîye bê ev bercewendî çî ne.. Her dem siyasîmedar û stratejîsyen, aborizan, û nivîskaran bal kişandine ser bercewendiyên hêzên sermayedar yê Rojavayî di herema Rojhilata Navîn de, û ev yek bi Petrol û Zêr û Zivên vî axê ve girê dane, ev tê wateyê ku tenê milê wê yê maddî dîtine û şîrove kirine. Ji ber vî yekê herdem kêm mane û dijminê xwe baş nas nekirine û kaos jîyan kirine, weke ku em dizanin deriyê hemû rêjîmên Rojhilata Navîn jî karsazên Rojavayî re vekirî ne û rê jî Holding û Fabrikayên wan re vekirî ne, hêzên Rojavayî çî bixwazin jî Rojhilata Navîn, pir bi hesan rêjîmên heremê yê weke xulam jî wan re dixebitîn pêşkêş dikin, ev yek Petrol be yan jî çî zengîniyê ser erd û bin erdê heremê be, her çiqas rewş wiha be jî lê êşkereye ku bercewendiyên hêzên sermayedarên Rojavayî van tiştan derbas dikin û armanca wan ya sereke ne Petrol û ne Zêr û Zivên heremê ye, armanca dawî û sereke ya van hêzên Rojavayî, şikandin û binxistina

rihê Şaristaniya Rojhilata Navîn e, her wiha windakirina çand û dîroka pêkhatyên Rojhilata Navîn e, bi wateyê zelal ew milên moral (manewî) yê gelên heremê jî xwe re kirine armanc. Hêzên Rojavayî ku dixwazin şaristaniya Rojava, weke şaristaniya yekemîn di Cihanê de bidin nişandan, piştî lêkolîn û şopandinên bi deh salan gihîştine vî encamê: «Şaristaniya Rojava nabe şaristaniyek Gerdûnî, bi hebûna şaristaniya Rojhilata Navîn, pêwîstî bi binxistina şaristaniya Rojhilata Navîn heye». Ji bo pêkanîna vî armancê misyon dane hêzên Îslamî, ku ew bi xwe pêkhatyek bîngehî yê Rojhilata Navîn e, lê hêzên Rojavayî û di piştî wan de aqilmendên Mason yê navnetewî pir baş fayde ji naveroka Îslamê ya hişk û sert dikin, ew baş nasdikin ku Îslam ne tenê Ol û Bawerî ye, Îslam bi sed sala weke sîstema dewlet hatiye bi rêvebirin, ji Emewiya bigre ta bîghêje Osmanliya herdem Îslam xwe berferê kiriyê û şer kiriyê jî bo tenê rengê xwe belav bike, û baweriyên mîna Xiristyan û Yehûdî û Zeredestî derew derxistîye, û xwestîye çanda Îslamî ya Erebbike çanda desthilatdar ya Rojhilata Navîn, û çandên din yê cihê reng qebûl neke û red bike, di roja me ya niha de em rastî vejîneke pir bi xwîn ya tevgêrên Îslamî tîne, heger hûn baş bişopînin; di hemû peçûnên bi xwîn yê di Rojhilata Navîn de, şûna tevgêrên Îslamî tê de heye, ev yek ne rast lê hatîneke. Hêzên Rojavayî bi zanebûn dest dirêjî nava van tevgêran dikin û wan jî bo armanca xwe ya sereke bi kar tinin, ji bo reşkirin û binxistina

şaristaniya Rojhilata Navîn. Çapa nûjen ya tevgêrên Îslamî, ku pir bi tundî derdikeve pêşberî me»Devleta Îslam ya Iraq û Şam», bi kurt nivîsa (DAÎŞ) weke tevgerekî, ku bi misyona çewtkirin û belavkirin û tunekirina şaristaniya Rojhilata Navîn radibe, ew weke nexweşiyekê ketiye laşê heremê de, weke jehrekê pir bi lez bi rih û moralê pêkhatyên Rojhilata Navîn de diçe, û jî xwe re Çand û dîroka hezaran salan yê gelê heremê armanc digre û dixwaze tune bike, pêxwasên çola û bêjiyên şaristaniya Rojava pir bi hovane êrîş dibin ser Bawerî û Çand û hebûna pêkhatyên Resen yê afrînerê şaristaniya Rojhilata Navîn, DAÎŞ ne tenê hêzeke leşkerî ye, ew hêzeke bi Bername û Pîlan û Bawerî ye, hêzeke bi zanebûn hatiye amadekirin û xwedî misyoneke mezin e. DAÎŞ weke rêxistin, encamê inflasyonê rêjîmên desthilatdar yê Rojhilata Navîn derdikeve pêşberî me, ev yek weke şensekî dîrokî li ser maseyekê zêrîn, ji hêzên Rojavayî re hate pêşkêşkirin û van hêzan jehra xwe berdan laş û mejiyên vî rêxistinê, û ew serxweş xistin bi tundtûjiya bi xwîn ya bawerîya Îslamî, her wiha bûye weke navendek sîxurên hêzên Rojavayî û yê heremî, DAÎŞ bûye weke Cenewarek ku hemû hêzên desthilatdar wê jî bo bercewendiyên xwe bi kar tinin, di serê van hêza de Amerika û Awrûpa bi rêka vî rêxistinê, nava xwe jî mirov û komên Îslamî yê tund paqîj dikin, berê wan dan Rojhilata Navîn di bin navê Cihadê, û her wiha bi rêka vî rêxistinê rengêkî pir bi xwîn û nebaş û paşverû dide Ola Îslamê,

û hiştîye ku ola Îslamê di navbera Misilmanan de bibe cihê guman û lêpirs û gengeşiyê, her wiha bi rêka DAÎŞ, hêzên sermayedar yê Rojavayî, dixwazin Neqşê Rê ya Rojhilata Navîn ya mezin çê bikin li ser bîngehê şerê navxweyî yê pêkhatyên Rojhilata Navîn, weke çawa bi xurtî agirê di navbera «ŞIAA» û «SUNNA» gur dikin, her wiha çawa Xiristyanê Mûsilê hatin koçberkirin, û bi hovane êrîş birin ser Kurdên Êzîdî xwediyê dîroka 3 hezar sal, û 200 hezar Êzîdî koçber kirin, 3000 jinên Êzîdî jî xwe re birin (sebaya) li gorî ola Îslamê, 5000 Êzîdî kuştin, her wiha li gelek cihên cuda li Iraq û Sûri pir wênciyên bi xwîn yê vî rêxistinê hene, ew xizmeta kûrkirina nakokiyên di navbera pêkhatyên Rojhilata Navîn dike, û şerê zengintîya şaristaniyê dike û dixwaze tune bike, desthilatdarên heremê jî bo parastina desthilatdarîya xwe jî vî rêxistinê Sûd werdigirin û berê wê didin millet û pêkhatyan, ev yek Iran dike, Sûri dike, Tirkî dike, Qatar dike, Saûdî dike, Urdun dike, ji bo gurkirina agirê di navbera «ŞIAA» û «SUNAA», desteka maddî didan, her wiha dewleta Tirkî ku ew bi xwe mirateyê împatoriya Osmanî ya Îslamî xwe dibîne pir bi xurtî piştigiriya DAÎŞ kiriyê beramberî hêzên azadixwaz yê Kurd û jî DAÎŞ sûd wergirtiye, bila baş zanibe eger ew pêvajoya çareserîya demokratîk û aşîtyê bi Kurda re pêş de nebe, ewê di nava demeke ne dirêj de bi agirê DAÎŞ bişewite, û bila hemû hêzên ku piştigiriya DAÎŞ kiribin baş zanibin ku ew tenê dawî û hilweşandina xwe dereng dixin, ev agirê ku ew bi xwe gur dikin,

bê çare ew wan dişewitîne û wê wan bişewitîne. DAÎŞ weke cenawerekî dev bixwîn êrîş her kesî dike û artêşên rêjîmên Sûri û Malikî bi bin dixê û pir bi hovane kuştinê dike û seriyên jî laşa vediqetîne û pesnê xwe bi vî yekê dide û li ser ragihandinê şerêkî pir bi zanebûn û bi bandor dide meşandin, artêşên ku hejmarê wan sed hezaran derbas dikin li her vî rêxistinê nikarin ber xwe bidin, artêşên xwedî top û tank û firok û mûşek nikarin xwe li her vî rêxistinê bigrin... Ev tê wateya ku ev rêjîm li hemberî vîrûsê DAÎŞ ne xwedî sistemek parastinê ne...! Vîrûsê DAÎŞ pir bi hesan dikare laş û mejiyê wan perçe perçe bike, gelo çare çîye ji vî halê nexweşiyekê kevn ne diyar)....? Weke hêza yekemîn ku şerê DAÎŞ kir, yekîneyên parastina gel bi kurtnivîsa «YPG» di roja me de weke hêza herî xurt ku beramberî DAÎŞ ber xwe dide û bê navber serkeftina bi dest dixê, yekîneyên parastina gel çî ye? U hêza xwe jî çî digre.....? Her nexweşiyek dermanê wê heye, her jehrek tîryaqa wê heye... rêxistina DAÎŞ ku jehra perçekirin û tunekirina çand û şaristaniya Rojhilata Navîn berdide laş û mejiyê gelên heremê, û bi kiryarên dijîmîrovahî komkujîyan pêk tîne, tenê yek hêz dikare jê re bibe tîryaq û wê bê bandor bike û koka wê hişk bike, ev hêz yekîneyên parastina gelên Rojhilata Navîn e, ev hêz hêza xwe jî biratiya gelên Rojhilata Navîn digre, ji mafê xwe parastina cewherî digre, ji mozaik û zengintî ya çandên Rojhilata Navîn digre, ji dergûşa mirovahî û biratî û şaristaniyê digre. «YPG» û «HPG» weke hêzên

sereke ku li ser vî şopê dimeşin û xwedî ev raman û bawerî ne, eşkere ye ku «YPG» û «HPG» parêzvanên hemû nîrx û bawerî û çand û dîroka Rojhilata Navîn bi hemû pêkhatyên xwe, «YPG» û «HPG» di meydanên şer de, weke melkemetê DAÎŞ tene naskirin, bi hêzeke biçûk lê bi baweriyekê serkeftinê xurt şer dike, bi çekên leşkerî pir bi sinor lê bi moralekî bê sinor xwedî li nîrxên gelan derdikevin, ev yek bi serê xwe tîryaqa DAÎŞ e ye. Li Rojavayê Kurdistanê bi sadan xort û keçên Kurd, ereb, û xiristyan tevî refê «YPG» û «HPG» bûne û di fermana Şengalê de bi sedan xort û keçên Êzîdî tevî refê «YPG» bûne û weke pêwîstiyekê bi lez yekîneyên berxwedana Şengalê «YBS» hate avakirin, nav çî dibê bila bibê, pir giring nîne...! ya bîngehî ew e li ser bîngeha xwe parastina cewherî û di rêka biratî û yekîtîya gel û çandên Rojhilata Navîn de xwe bi rêxistin kirine. Hemû gelên Rojhilata Navîn vî yekê baş nas bikin «Misilman, Xiristyan, Yehûdî, û Êzîdî», vîrûsê DAÎŞ xwe li ser olperestî û netewperestîya me dide jiyankirin û bi vî awayî wê dawî li biratiya gelên Rojhilata Navîn bîne, û ew ê bibe ser sedema dijîminatîya bi hezaran salan, hemû ol û bawerî û çand û netewên heremê vî yekê baş nas bikin û bibin xwediyê tîryaqa DAÎŞ e û piştigiriye bidin «YPG» û «HPG» «li ser rîya sazîkirina hêza parastina Rojhilata Navîn.

We Ev Hevpeyvîn Bi Mihemed Şêxo Re Xwendiyê.... Helbet..Na! Dengbêjek Ji Kurdistanê Sûriyê ..Mihemed. Şêxo



- Ez Kurdistanek wekhev û azad û serbixwe bi pêşengiya zarokên karker û cotkarê zana û têgihiştî difikirim û dixwazim
- Her partiyekek dixwaze ez bi wan re bim, ta dengê min belav bikin, ez ne malê tu partî û rêxistina me ez xwe wek malê welatê xwe û gelê xwe dibînim .
- Hêj ez zarok bûm û di sinifa sisyan de bûm, min guhda rî radoyoya Kurdî ya Erîvanê dikir.
- Heya ku dewlemend û ser mayedarên welêt « pêşevaniya » tevgera Kurdî bike, doza welat bi ser nakeve.
- Rizgarbûna welatê me ne di bin pêşengiya karker û xizanê welat de be nabît.
- Hunermend, ji bo daxwaziya gelê xwe divê wek berdevk bin.
- Di vê xebatê de divê hunermend ji tiştêkî netirse. Wekî pêşmergekî bêhempa ji bo welatê xwe canê xwe bide.

Gelek hunermendên dilsoz ji navgelê Kurdistanê derketine. Ji van hunermendanên ku li seranserî welat bi dengê xwe û bi tenbûra xwe tînan naskirin yek jî Mihemed Şêxo ye. Me pêwîst dît, ku hevpeyvînekê bi Mihemed Şêxo re bikin û wî xweştirîna bi hinek nêrînan wî bi rêka « Armançê » bi gelê xwe û welatperwerên wê bidin naskirinê.

- Heval Mihemed Şêxo, te derd û janên gelê xwe û welathizîya xwe di stranên xwe de daye xuyakirin. Ji ber vê yekê, ku gelê Kurdistanê û şoreşgerên wê ji te hez dikin. Em dixwazin çend pirsan ji te bikin û bersîvan te, te xweştir nas bikin û bidin naskirinê. Tu dikarî bi kurtayî ji yana xwe ji me re bêjî ?

M. Şêxo: Ez di sala 1948 an de, li Kurdistanê Sûriyê li bajarê Qamişlo li gundê Xecokê hatime dinê. Ez ji binmalekî cotkarê piçûk bûm. Min xwendina xwe a seretayî (dibistana destpêk) li gundê xwe qedand. Piştî re hatim bajarê Qamişloyê (1965). Li vê derê min xwendina xwe domand. Heya sinifa neha min li Qamişloyê xwend. Piştî re min şandin leşkariyê. Paşê ez ji leşkariyê hatim afûkirin. piştî afûbûna min a ji leşkariyê, di sala 1969an de ez çûm Lubnanê, bajarê Beyrûdê. Li Beyrûdê, ez çûm ketim Merkeza Yekîtiya Muzîkê. Min li wê derê tu dewran darsa muzîkê stand. Di wê demê de min li Beyrûdê di nava koma muzîkê de stranên Kurdî û muzîka Kurdî pêşkêşî gel dikir bi şiklê konsêran. Sala 1972 an ez vegeryam Sûriyê, bajarê Qamişloyê. Li wê derê min kar li Rimêlan (Rimêlan, çiyê ku li seranserî Sûriyê ji hemû deran pirtir petrol li wê derê dertê - Armanç -) stand. Li Rimêlan ez bûm serokê komika muzîkê. 1973an de ez ji wir derketim. Ji wî katî şûn de ez mame bêkar. Di sala

1974an de ez çûm Kurdistanê Iraqê. Ez heya şikestina şoreşa li Kurdistanê Iraqê mam. Piştî teqûna şoreşa Kurdistanê Iraqê ez çûm Îranê. Li Îranê ez bûm mamosteyê dibistanê yê zimanê Erebi. Ez heya sala 1983an li Îranê mam. Sala 1983 an ez vegeryam Sûriyê û heya niha jî ez li Sûriyê me û bêkar im.

- Te çawa dest bi stranên kir û çî bû sedemê ku te hunerê xwe pêşkêşî rêka welatperwerî kir? M.Şêxo: Beroşa ku jê nexwim, ez arê wê nakim. Ev gotin gotineke Kurdî ye û ez jî mirovekî kurd im. Ji piçûkî de mereqa min li ser stranên û muzîkê hebû. Hêj ez zarok bûm û di sinifa sisyan de bûm, min guhda rî radoyoya Kurdî ya Erîvanê dikir. Ji ber ku wî katî bes radyoya Kurdî ya Erîvanê hebû. Guhdarîkirina radyoya Erîvanê hem mereqa min zêdetir dikir, hem jî bû sedemê ku ez hînî fikrê nû bûm. Vêca min bawerî anî, ku stran û muzîk parçeyek ji doza welat in. ez dikarim bêjim ev bûnc sedemên bingehînî ku ez bi Kurdî stranên bêjim. Her milletekî muzîka wî heye û ew muzîk parçeyek ji pêşveçûna millet e. Ji ber ku ez jî Kurd im û milletê Kurd, milletekî bindest e, zimanê wî hatiye qedexekirin, hewce ye, ku mirovê welatperwer, hunerên xwe di vê rêça han de bide şixulandin. Min jî ev kiriyê. Ev jî bo milletê me jî ev kiriyê. Ev jî bo milletê me jî ev kiriyê. Ev jî bo milletê me jî ev kiriyê. Ev jî bo milletê me jî ev kiriyê. Ev jî bo milletê me jî ev kiriyê.

- Wekî tu dizanî, gelê me di bin nêrî mêtîngêhakariyê de ye û welatê me ji alî mêtîngêhakarên û emperyalîstan hatiye

parvekirin. Tu rizgarbûna welatê me çawa dibînî ? M. Şêxo: « Çavê li deriya xwelî li seriya ». Ev gotin gotineke pêşiya ye. Ez dixwazim vê gotinê bi vî awayî mane bidimê: Ger em nebin wê dost çî bikin ? berî her tiştî divê em hebîn, piştî re em hêviya xwe ji dostan bikin. Ez vê gotina han dikim ne ku tê wê manê me tu dost anîne. Di vir de daxwaziya min ew e, ku ez bidim xuyakirin, berî hemû tiştî divê em hebîn û ji xwe bawer bin. Ez dixwazim niqteka din ji bidim xuyakirin. Heya ku dewlemend û ser mayedarên welêt « pêşevaniya » tevgera Kurdî bike, doza welat bi ser nakeve. Ger biser bikeve jî wê sermayedar ji bo xwe bi kar bînin. A diduyan ji ew e, ku emperyalist heyra îro jî tu daran nebûne dostên gelê



bindest û ew tu carî rizgariya me nadin me. Ger ji beçareyî bidin jî wê bidin hevalbendên xwe, sermayedaran. Ji bona vê yekê ez dibêjim rizgarbûna welatê me ne di bin pêşengiya karker û xizanê welat de be nabît. Yanî ez rizgarbûna welat di bin pêşengiya karker û xizanê welatê de dibînim.

- Tu di tekoşîna rizgariya civakî û netewî de çî bar li ser milê hunermendan dibînî ? M.Şêxo: Li gor ditina min hunermend, ji bo daxwaziya gelê xwe divê wek berdevk bin. Yanî daxwaziya gelê xwe di hunerên xwe de bidin xuyakirin. Ji bo vê yekê jî ez hewce dibînim, ku daxwaziya gelê xwe di hunerên xwe bidin xuyakirinê. Wekî ku tê zanîn, hunermendî

qetek (parçek) ji çanda gel e. Her hunermend bi pêşkêşkirinê hunerên xwe çanda gelê xwe didin xuyakirin. Ew jî divê bi rengekî daxwaziya gelê be. Û ji bo pêşveçûna gel kar bike. Berî hemû tiştî ev tişt jî hunermendan tînan xwestin. Ez di vî warî de dibînim, ku di tekoşîna rizgariya netewî û civakî de tiştên dikeve ser milê hunermendan ew in, ku daxwaziya welatê xwe û gelê xwe di hunerên xwe de, di stranên xwe de, muzîk û edebiyata xwe de bidin xuyakirin. Ev tişt pêwîst in û berî herkesî jî hunermendan tînan xwestin. Da ku muzîk, stran, edebiyat, zimanê gel pêş ve biçin. Da ku giyanê welatperwerî û şoreşgerî li ser piya bimîne û xurt bibê. Bi bawerîya min, tiştên ku di qonaxa tekoşîna rizgariya civakî û netewî de ji hunermendan tînan

diparêzim, divê ji bona çina karker û cotkar be, ne ji bona çina sermayedar û burjuwazi be.

Qasî em dibihîzin, ev çend sal in, ku tu ne wek berî çend salan bi germî distirêyî. Sedemên wê çî ne ? M.Şêxo: Ez berî hemû tiştî dixwazim viya bidim xuyakirin, ez wekî berê me. Lê hinek tişt hatine guhertin, wekî ku berî çend salan zimanê Kurdî hatibû qedexekirin. A din jî, di nava Kurdan de hunermendên stranbêj kêm bûn. Wê demê ji niha bêtir dengê min dihat guhdarî kirin û seh kirin. Lê niha ji ber ku zimanê Kurdî li ba me hinek bi serbestî tê axaftin, partî û komik jî berê zêdetir bûne, êdî wek berê dengê min jî nayê sehkirin. Li gor ditina min sedemên bingehîn ev in. sedemek din jî ew e, ku her partiyekek dixwaze ez bi wan re bim, heta vê dengê min belav bikin. Ez vê yekê qebûl nakim. Bila qet belav nekin, ez ne malê tu partî û rêxistina me ez xwe wek malê welatê xwe û gelê xwe dibînim. Ev tiştên ku niha min gotin ew jî dibin sedemên ne belavbûna dengê min. ez dişa dibêjim, ku ez ê berê me û li gor bawerîya min hîn ji berê zêdetir im.

- Armançê te di qatê pêşedir de çî ne û tu dixwazî çî bikî ? M. Şêxo: Armançê min di qatê pêşedir de ew in, ku li gor îmakanên xwe û gelê xwe ji bo rizgariya welatê xwe xebatê bikim. Min pêşiyê jî dabû xuyakirin û gootibû, armançê min ew in û wê her ew bin jî. Ez ê ji niha û bi şûn de ji li ser vî karî bim û berdewama karê xwe bim.

- Di tekoşîna rizgariya netewî û civakî de baweriyên te yê çî nayetî çî ne ? M.Şêxo: Li gor bawerîya min di tekoşîna rizgariya netewî û civakî de ku ne bi destê çina karker û kedkarên din be û ne di pêşengiya wan de be, em rizgar nabîn. Rizgariya me ya heqiqî encax bi destê çina karker û kedkarên dibe. Wekî me berê jî gotibû, sermayedar bes ji bo

xwe bikin. Rizgariya bi destê sermayedaran ez rizgariya gelê me nabinim. Ji ber ku sermayedar wê her ji bo xwe bin. Ger wisa be, wê dişa gelê Kurd bindest bimîne. Ha em bindestê sermayedarê Kurd ha em ê sermayedarên biyaniya ne, ji bo çina karker û kedkar tu ferqa wan tuneye.

- Tu Kurdistanek çawa difikrî ? M. Şêxo: Ez Kurdistanek yekhev û azad û serbixwe bi pêşengiya zarokên karker û cotkarê zana û têgihiştî difikirim û dixwazim.

- Daxwazên te ji bizavên rizgarîxwazên Kurd yê li her çar perçan çî ne ? M. Şêxo: Yekîtiya Ji ber ku her tişt di riya yekîtiyê re pêk tê.

- Li gor bawerîya te dijmînen gelê Kurdistanê û dostên wî ki ne ? M. Şêxo: Dostên gelê Kurd, ew in ku berî her tiştî ew gelên ku zilm ditîne û hê jî di bin zilme de ne, dijmînen wî jî, her ew kesin ku zilm kirin û hê jî zilmê dikin. Ger te bivê zelaltir bikim. Ez dikarim bi vî awayî bêjim: dijmînen gelê Kurdistanê, dewletên mêtîngêhkar û hevalbendên wan emperyalîzma cihanê û di serî de emperyalîzma Amerîka Yekbûyî ye. Di nav welêt de sermayedarên Kurd in. dostên gelê Kurdistanê jî bindestên dinê û welatên sosyalist in.

- Daxwaza te ji kovara Armanç çî ye ? M.Şêxo: Daxwaza min ji kovara Armanç ew e, ku çî tişt dike bi rastî û heqiqî çap bike nebêje ev hevalê me ye, yan jî ne yê me ye. Tiştên wî guhertîne çêbike, an jî çap neke. Her tişt weke wî mafê wî bidiyê, wek hêjayê wî. Ez hêviya pêşketinê jê re dikim di rêya rast û dirust re û spas.

Ev belge ji erşîfa D. Es'ed Michas e.. Rojnâmeya Bûyer spasîya wî li ser vê belgeya dirokî ku ji bo roja bîranîna hunermendê mezîna M. Şêxo gihand destê me dike

Adarok

Di riyeñ efsaneyên jibîrbuyî re
Vaye bi çarîneke xakî re tēm...

Xwe bi destên şewqa çirayan
digrim,
Bi milê ken,
Ronî bi ronî,
Stêr bi stêr,
Roj bi roj
Xwe digihînim dergehê sînga
te.

Tevî bîna pelên gwîzê
Hatim bihingivim Adaroka çav
hişin
Ya ku mîna neçşa çiniyekê
Xemilandiye ruyê dilê te...

Ez ê di şewqa Newrozê çeleng
de,
Berî zarok xwe li ser agir
biqevêzin,
Mîna pîrpirîkekê,
hemî rozerînan hilgirim,
Werim ramûsana laşê Adarokê,



Fatma Savci

Bila, li ser pelkê wê yî cewîka
xewnan
Her keli,
Her bîst û çar saetan
Wekî morîkek hişin,
Wekî kevirêki Kristal vekiçim...

Ji bo ku,
Herdem,
Bejn û bala Adaroka me,
Bî xwîna xwe ya din
Av bidim...

Ji bo ku,
Temenê hemî kulîlkên evîndaran,
Û emrê kenê çavên te dirêj
bikim...

Cihên ku li navên
xwe digerin

Beriya demkê kurdek bi
kurdekî re axivî û jê pirsî: Tu ji
ku yî? Yê di lê vegeand: Ez ji
Qahtaniyê me. Yanî ji bajarekî
ku reh û kokên wî vedigerin ser
bapîrekî ereb yê xwerû, dêrîn û
kevnare. Dema yê pêşin pirsyara
cihê wî bajarî jê kir, yê di diyar
kir ku navê bajêr "Qibûr Elbîd"
bû.

Di nava 30 salî de, navê bajêr du
caran hate pelixandin. Carekê bi
wergerandina navê kurdî yê bajêr
"Tirbespî" bo "Qibûr Elbîd" û
carekê bi riya guherandina wî bi
yekcarî û girêdana wî bi kokeke
dîrokî û "rastkirina kumê dîroka
jibîşxweçûyî."

Bi dehan navên ku, niştêcibûna
kurdan di cihwarên wan de nişan
didin, hatin girtin. Piştê bi riya
wergerandina peyv bi peyv, ev
nav hatin sirgûnkirin. Dûre di
sirgûna xwe li welatekî erebî
yê li bakurê vê sazûmanê de, ev
navên kurdî hatin bidarvekirin û
şerjêrkirin.

Navê serdemên arkeoloji û
qiralên wan û ciwarên hestî û
termên wan wek xwe hatin hiştin.
Lê ew nav hatin bidarvekirin ku
amaje didin miletekî hêj zindî û
sax li hin cihên hêj zindî û sax
ku dem û dewranê ew bi korîtî li
nexşeyan belav kirin, nexşeyên
ku bi sînoren bi korîtî hatî danîn
vedigevizin û li bin guhê hev
dikevin.

Di demkê de ku tîlên di
navbera neteweyên erebî de
wek "parçekirinê" plankirî
yên cografîyê, ku ji hêla
xayîntî, siyasat, arezû, neheqî û
dekûdolabên "yê din" ve hatine
dirustkirin hatin dîtin; di heman
demê de dîrokê nikarîbû xwe
bispêre zimanê niştêciyên xwe,
di xetêke erdê di çarçoveya teksta
mezin de, da ku amadebûna wan
ji cih re bipeyitîne: Wiha, hertim,
cih li benda "nijada dahatû"
bû, da ku pesindana resenî û
kevnariyê li xweşa wî here, bi
taybetî pesindana nijada resen
ku bi bayê hebûna xwe rastiya
cih pêk tîne.

Cih, her û her, bêyî miletekî
"din" e û yên ku soz ji wan re
hatiye dan wî tijî dikin. Deverên
kurdî bêyî hebûna kurdan yek
ji pêwistiyên wergerandina
erebiyê xwerû ne. "Moza" dibe
"Til Elereb", "Herem Reş"
dibe "Safiya", "Mosîsana" dibe

Pesnê Berzanî

Qehremanê esrê bîsta Mistefa
Berzanî tû
Kelemê di çavê Tirk û Erebi
Eyranî tû
Nav û dengê te belav bû her şêrê
Berzane tû
Her di sînga dijmanan de Restem
û Şergo ye tû
Li zozik û Hemrîn û Helgurt
pêşengê şervan e tû
Neviyê guherz û Zalê gurzê li
meydane tû
Qehremanê Baba Gurgur mîrxas
û şervan e tû
Her tu wî bejna bilindî Sipan e û
Botan e tû
Çêliyê bazê çelengî bazgerê çiya
ye tû
Te serî qet ne tewandî her bavê
Mesûd e tû
Generalê Mchabatê hevalê Qazî
ye tû
Sîtêra ezmanê Kurdî ronîya
Hewlêr e tû



Besam Mistefa

"Eldecaac Elxedraa", "Herem
Şexo" dibe "Qeriyet Bedir",
"Qolo" dibe "Elmermeriye" û
"Sirkê" jî dibe "Elmehbûse" ...
htd.

Di tomar û qeydên fermî yên
dewletê de, qedexê bû kurdek
bi navekî kurdî bêtomarîkirin.
Erebîzm, guherînkê di xîslet û
taybetmendiyên xwîne de ferz
dike. Lê va êdî ew guherînkê di
xîslet û taybetmendiyên xakê de
jî ferz dike.

Babet sade ye û ne hêjayî
dilmanî û li ber ketinê ye.
Çimkî hem navên kesayetî û
hem navên cih û deveran, li
hember dadmendîya serketî
yeksan û hevta ne; Dema niha,
koka rabirdû û himê hebûna xwe
ye.

Li gorî yasaya qirkirinê di hin
pile û dereceyên dîrokê yên
borî de, bîrweriyek bi temamiya
xwe anîha têt qirkirin û nehiştin.
Dê nevi li reşke û xeyalên
bapîrên xwe bizivîrin û wan di
parçeyê helawîstî yê berzêxê,
bêyî niştêcibûneke di mekên de
bibînin.

Dîroka niha, bi hêza zimanê
erebî ku xwe dispêre cilika xwe
ya neteweyî ya mîrêsdar, her tiştê
ku hebûna miletekî din bibir tîne
piştguh dîke û xwe jê xafil dîke.
Çimkî kurd ne weke hin miletên
berê ne ku di pêla qirbûna gel û
miletan de rastî nemanê hatin û
lewra jî navekî wan di nav tomar
û qeydên fermî de ma.

Lê li ser Girê Moza ku zêrê di
kûzan de lê hate dîtin, xetêke
sêwî jî ji Boxê Birîva re nehat
hiştin.

Guherîna di pênasîyê de dibe
bibêje, Romên ku şer wînda kirin
û ber bi asîmanê xwe vegeyran,
ev zêr û şunwar weke diyarî li
gundekî kavîlbûyî li pey xwe
hiştin, heta neviyên Zêd û Omer
hatin. Lewra qet ti kesî beriya
wan li wir, li ser Girê Moza zêr
û gewherên dêrîn ranexistîye.
Ev çî tirs e ku rastiye bi ala partîyê
dinixumîne? Ew tenê navên
kurdî ne ku ti kesî natirsînin. Êdî
çima cih û deveran ji niştêcibûna
wan bêpar dikin?



Dilbirin

Kurd li cihanê danasî dîrok û
ferheng tû
Dibistana jîr û zana serok û rêber
e tû
Helbest û rist û sirûdî dildarê
hozan e tû
Her di qada berxwedanê qêrîne
pêşmerge tû
Qet serî te netewandî Kordoxê
Mîtan e tû
Çiqasî pesnê t bîjim hêja ye
Mistefa tû
Sed hezar silav ji bo te her Bavê
Kurda ye tû

Pêşwazî

Ebdulsemed Bavê Helbest

Li ber dergehê
Avahiyeke Fermî
Rawestiyam...!
Rojek, du roj, Sê Çar, Deh!!
Navê te Çi ye?
Doza Te Çi ye?
Karê te Çi ye?
Navê min, Kurdo ye,
Mala min li Qamişlo ye, ne li
Oslo ye
Helbestvan im, hhhhhh!?!
Ev çî Kar e? Firoşgeha te li Kû
ye?



Mi got ez nivîssssssssss
De her ji vir
Te çî frotiye, te çî kiriye?
Te sîd ji karê xwe kiriye?
Ji xwe yê berpirsyarê
Vê avahiya mezin,
Ji yên weke te re vala ye.....!?!?
Hhhhhhhhhhhhhhhhhhhhhhhhhhhhh
hh.....

Nêşînge û Têlên
Sînor
"Kurteçîrok"

Pêşeroj Cewherî

Tê bîra min salên berî
1970 ez kurekî sava û sîpe
bûm, bîrîvan ji gundê me
Cewheriya diçûn bêriyê
li Mûş destên gundê
Hemdûnê, şivanê gundê
me Ünîsê Reş bû her dem
dixeyidî û qerebalix dikir û
ji bêrêvana re digot: çima
hûn dereng tîne bêriya xwe.
Lê mixabin ew jiyana gundê
me li me çû gili bi şeweyekî
taybet piştî salên 1970 û vir
de ji ber ku rijîma parta Bas
a nazî li Sûriyê pirojeyek li
welatê me bikar anî li ser
navê Kembera Erebi, di vê
pîrojeya rûrêş û ne mirovati
de ereb ji parêzgehên ser
çemê Ferat anîn welatên me
Rojavayî Kurdistan bicikirin
û xak û ava me li wan dabêş
û diyarî kirin, ev pilana sext
e û derzagon û demirovati
axa welatê me dagîr kir, ji
Serêkanî û ta Dêrika Hemko
nêşîngehên ereban lê avêdan
kirin û şênîyên resen ji ber
wan derbider bûn, xwediyên
axê ji kurmanca koçê bajara
bûn û birçî, xizan bûn û
hemî bûn barkêş û boyaxkar
li mitropolên cihanê bela
bûn, yek ji wan gundê Girê
Hemdûnê bû, ev pîrojeya
nijadperest bi alikariya
dijminê mezin tirkîyê pêk
hat, piştî tirkîyan sînoren
saxtê bi agir û hesin û tîl
û mayînan asê kir pilana
Kembera Erebi cêbecibû
li welatê me, îro ez diçim
ser Girê Hemdûnê li ser
wan şînwaran rûdînem û
diponijim dikevim derya
sîber û hizran, xayîz dibim û
dîrok liber çavê min diherike
weke çemekî bi xumxum tê
de gêj dibim.

Di vê derbarê de û ji nîşka
de yekî silav li min kir bi
silava wî re vecinîqim:
- Ho Pêşeroj hizra çî dikî lo..
li kîjan alî dinêrî, li nêşîngehê
yan li sînor.
Ez jê tirsîyam weke xêv
û tebakî bû ne di rengê
mîrovan de bû, quloçên wî
hebûn min jê pirsî û got:
- Tu çawa min nas dikî.
bersîva mi da û got:
- Ez her tiştî dizanim
- Tu çî ye? Mîrov e yan
meçêtir e.



- Ez ne mirov im û ne meçêtir
im we mirovan bi bêbextî
navê min kiriye Ehrîman.
- Ho tu Ehrîman e...!
- Erê, mane hûn misilman
dibêjin em birayê hev in
wek diranê şehkî ne.
- Mebesta te jî vê peyvê çî
ye?
- Mebesta min ev nêşîngeh û
ev tîlên sînor e, lê hera wilo
bê te serê we peyxemberê
wir bixwe dibêje ol û
bawermendiya wî ji alî
Xwedê de nayê pesend û
pejirandin.
- Li gor peyva te Xwedê ola
kuda pesend nake çimkê ol
ji nezana re nine.
- Li gor peyva peyxemberê
we Xwedê wilo dibêje
- çima
- Binêre mamoste Pêşeroj ez
400 salî berdevkê dewleta
Osmanî name û her weha
dewleta Sefewî û Emewî lê
mixabin Selahedîne we tenê
min kir û nekîr da ku pê re
kar bikim, hertim ewî bera
min dida û ji min re digot:
Eger çêbûna Kurdistanê li
ser kuştina mirovekî bimîne
ez wî mirovî nakujim.
- Çare Çi ye birayê Ehrîman
?

- Destê xwe tîxin destê min
ma ez ji Etatîrk û Eflaq û
Xumeynî neçêtir im tu bawer
bike di cihanê de şoreşvanê
yekemîn ez im, de here malê
û dîroka xwe ji nû ve bixwin
û dijminê xwe nas bikin .
- Ji nîşka de ez vecinîqim
min li dora xwe nêrî ku kesek
nine ji bilî nêşîngeha Erebi û
tîlên sînor û serbazên Tirk.
Bi vî awayê ez vegeyram
malê û bi rê de ristepeyvek
min afirand li ser navê
nameyek ji Hemdûnê
Kanî salên berî heftê
Ba nagere cê jê dertê
Gelo nîrê ser me zor in
Lê bawer im roja me tê

Dê bimîne girê Hemdûn
Ku rabe ji binî gerdûn
Were mafê xwe bernadin
Ta ku derê roja xweybûn

Belê Seydayê
Min

Azad Zal

Belê Seydayê min,
Derdê hemû dinyayê, hemû
êş û jan têt kişandin lê «derdê
ehmeqan» tu caran nayê
kişandin... Îro dîsa van çend
rêzên ku te ji nava kezêba
rastiyê kişandiye dîsa bi bîra
min ket...

Ax û ne sed caran, hezar caran
ax...
"Bila çil sal li zindanan
bimînim,
Her roj sed mar û dûpişkan
bibînim,
Li hevraza barê aşan
bikişînim,
Li berwara pezkûviyan
biçerînim,
Zivistanan li ser avan bimînim,
Ne ku carek yekî ehmeq
bibînim."
[Şêx Evdîrehmanê Axtepî]



Derdê hemû dinyayê, hemû
êş û jan têt kişandin lê «derdê
ehmeqan» tu caran nayê
kişandin... Îro dîsa van çend
rêzên ku te ji nava kezêba
rastiyê kişandiye dîsa bi bîra
min ket...
Ax û ne sed caran, hezar caran
ax...
"Bila çil sal li zindanan
bimînim,
Her roj sed mar û dûpişkan
bibînim,
Li hevraza barê aşan
bikişînim,
Li berwara pezkûviyan
biçerînim,
Zivistanan li ser avan bimînim,
Ne ku carek yekî ehmeq
bibînim."
[Şêx Evdîrehmanê Axtepî]

Piştî deh
salan

Yasîn Hac Hisên

Piştî deh salan...
Me hevdû dit...!
Li welatekî sar
Me destên hev diguwaştin...
Û Çavên hev radimûsandin
Digote min: Min Peyalek şîr
divê...
Li wî cihê efsaneyî û sar
Careke din çavên min guvaşt
Û bi ramûsaneke din
Bi germî digote min: Em ê
vegerin...

Hevalekî min helbestek bideng ji
min re şand
Dengê wî, perçak ji helbestê û
buhuştê bû...
Bang dikir: Ger ez mirim...
Payîz dinixumandin û li min
dipêça.
Dema bi min re axivî
Ji min re got:
Çima baran dibare?
Min got:



Çima firîşte tene ber çavên
min...?
Çima xatir ji gotinên te dibarin?
Rewrewkê bûbû sînore navbera
min û Xwedê...

Sê caran dengê ji dîr dihat
min:
Yasîn... Yasîn... Yasîn.
Deng li qiraxa buhuştê fetisî...
Ez jî di nava bombeyên
rewrewkê de dialiyam...
Mîna serxweşan (Giriye Ehmed
Huseynî... hesretên Ciwan
Xoce... Oda Ebdulqadir Mûsa
ya tiye çixare û helbest...hêstirên
di nava dilê Xesan Cangîr...
çixareyên Ebduletîfê Huseynî...
stranên Mehmûd yên beravêtî)
Binxet li ber çavên min dibû
gulokekê berfê...
Dema ew wî dengî... xatir ji min
xwest...

Qonaxa Yekem Di Yekîtiya Zimanê Kurdî De Yek ABC Bo Zimanê Kurdî

"Di yekîtiya ziman de gava pêşîn ji yekîtiya herfan e, yanî ji bona nivîsandina zimanê miletekî divêt zana û xwendewarên wî miletî bi tevayî ji bona zimanê xwe elfabeyekê bibijêrin û heke di wî zimanî de çend zar hene, zar hemî bi wê elfabê bêne nivîsandin", Mîr Celadet Bedîrxan - Hawar, hejmar 9an.

Pêşgotin: Her ez ji wisa wek mîr Celadet Alî Bedîrxan mîrê Kurdîya modêrn bawer im ku gava pêşî di yekîtiya zimanê Kurdî de ew e yekîtiya tîpan e, û min ev hevoka wî ya ku di hejmarê nehan de ji Hawarê belav kiriye wek bingehê ji bo wê vekolînê bijartiye, ango jibo yekbûna zimanê Kurdî di qonaxa yekem de divê yek «Abc» hebe ku hemû zaravên zimanê Kurdî pê binivîsin, di qonaxa diwem de yekîtiya tîman e, dîv re di qonaxa dawîn de yekîtiya rênivîs û rêzimanê tê, bi vî şeweyî em dikarin zimanekî stander saz bikin.

Mijar: Abc yên ku Kurdan di mijoya xwe de bi kar anîne ev in: (Nivîsa mixî - Abc ya Avesta - Abc ya Aramî - Abc ya Berê ya Pehlewî - Abc ya Masî Soratî - Abc ya ku Kurdên Êzîdî bi kar tanîn), û wek em dizanin zimanê Kurdî ta nuha bi sê Abc yan tîpê nivîsin (Latîni, Erebi, Kirilî).

Ji xebatên zimanzanan ji diyar dibe ku bi piranî ew xwediyê wê hizr û ramanê ne, ku di zimanê Kurdî de çar zaravên serekî hene: (1) kurmancî (2) soranî (3) zazakî (4) lorî. herdû zaravên bingehîn ji di zimanê Kurdî de Kurmancî (ya Jorîn û ya Badînî) û Soranî, piraniya miletê Kurd ku (zêdeyî 80 %) bi van herdû zaravên sereke di-axivin, herçende ev herdû zarave ji wêje bi wan hatiye nivîsin, ev yek ji dide diyarkirin ku bingeha Kurdîya stander wê ji van herdû zaravên sereke Kurmancî û Soranî pêk bê.

Herweha nêzikî (98%) ji miletê Kurd bi herdû Abc yên sereke ya Latîni û ya Erebi dinivîsin, li Bakur û Rojavayê Kurdistanê Abc ya Latîni tîpê bikaranîn a ku mîr Celadet Bedîrxan bingeha wê danî, û ji 31 tîpî pêk tê, li Başûr û Rojhilatê Kurdistanê Abc ya Erebi tîpê bikaranîn a ku gellek caran hatiye guhartin û rastkirin û nuha ew ji 34 tîpî pêk tê, tenê Kurdên Yekîtiya Sovyêt ya berê bi tîpên Kirilî dinivîsin û hejmarê wan sebarêt miletê Kurd pir kême nêzikî (2%) ji hejmarê giştî a miletê Kurd e. «ev xal bi pêwîstî serhejmarê ye»

Lewre pêşinyara min ew e, ku zimanê Kurdî bi yek Abc yê bête nivîsandin wek gava yekem li ser rêka yekîtiya zimanê Kurdî û peydakirina zimanekî stander, ev yek ji li ser me disepênê bijartina Abc ya Latîni an Abc ya Erebi çimkî ev herdû Abc yên serekî ne di nivîsa Kurdî de, piraniya zimanzan û rewsênbirên Kurd Abc ya Latîni guncawtirin dibînin bo zimanê Kurdî, her ez ji bi vî nerînê re me jiber van sedemên jêrin:

•zimanê Kurdî di gurûpa zimanên Îrani de ye, ku ew ji şaxeke ji şaxên zimanên Hîndo Ewropî ye, û ji zimanên (Kurdî-Farîsî-Efxanî û Tacîkî pêk tê), û piraniya zimanên Hîndo Ewropî bi Abc ya Latîni tîpê nivîsin. •Dema merov bala xwe dide zimanên Hîndo Ewropî merov rastî gellek peyvên nêzî hev tê, Ev rewşa hanê ji bo hemû zimanê ku di heman malbat û komê de ne wîsan e, mîna: zimanê Kurdî, Îngîlîzî, Almanî, Fransî, Farîsî, Grikî.

•Abc ya Latîni guncawtirin Abc ye bo bilêvkirina dengên zimanê Kurdî, nemaze tîpên dengdêr yên ku di Abc ya Erebi de tune ne, û bi zehmetî tîpê bilêvkirin, bi taybetî tîpa (i) ku ev deng di Abc ya Erebi de tune ye lê di heman demê de ew dengê resen e di zimanê Kurdî de û tîpê bilêvkirin lê nayê nivîsin çimkî tu tîp di Abc ya Erebi de li hemberî wê nînin lê di Abc ya Latîni de ev tîpa (i) tîpê nivîsin û tîpê bilêvkirin.

•Pirsgirêka din di Abc ya Erebi de: A.ku ew amajeyî du dengên cuda di Kurdî de, dengdêra kin (U-u) û dengdêra (W-w) bi heman tîpê dike: (U-u, W-w) : و

B.û amajeyî herdû dengên cuda dengdêra dirêj (Î-î) û dengdêra (Y-y) bi heman tîpê dike: (Î-î, Y-y) : ي

Û ev xal bixwe kêmasiyek pir mezin e di Abc ya Erebi de, ku tîpên dengdêr û ên dengdar xwedî dengên cuda bi yek tîpê tîpê nivîsin.

Jiber van sedemên ku me li jor şirove kirin, tîpê xuyakirin ku Abc ya Latîni guncawtirin û baştirin Abc ye bo nivîsandina zimanê Kurdî, Celadet Alî Bedîrxan yekem zimanzanê Kurd e

ku Abc ya Latîni bo zimanê Kurdmancî ji 31 tîpan danî, her ez ji Abc ya wî dirust dibînim lê pêşinyara min ew e ku hin tîpê lê zêde bibin, çimkî hin deng di Kurdî hene Abc ya Celadet wan nade diyarkirin her ew deng ji di Abc ya Erebi de hene ya ku li Başûr û Rojhilatê Kurdistanê tîpê bikaranîn, dengên (ع,ع,ع) di gellek peyvên Kurdî ên resen de derdikevin lewra pêwîstî bi zêdekirina van tîpan li ser Abc ya Celadet heye, pêşinyara min ew e ku Abc ya Latîni a Celadet ya ku ji 31 tîpî pêk tê bibe bingeha Abc ya yekbûyî bo zimanê Kurdî û 3 tîpên din lê zêde bibin, bi vî awayî hejmarê tîpên Abc ya nû dibe 34 tîp. Nîmûne li ser her sê tîpên (ع,ع,ع):

ع : باعترى , عاور , بعيف , عتجور «ecûr, b'if, «ewr, Ba»edrê : باغ , قوناق , غمطين Xemgîn , bax , qonax , baxçe : ح : حافت , ثلح , تكتت , تحطيش , حترى

Herî , tehlişk , teht , peh , heft Şanik: A- di Abc ya Erebi de du tîpên din hene ku ew di Abc ya Latîni de tune ne: (ر, ل)

Ev herdû tîp wek du tîpên li dîv hev tîpê bilêvkirin, lewra em dikarin di Abc ya Latîni de heman tîpê dubare bikin bêyî ku em tu tîpên nû bi-afirinîn : (ll , rr)

ر : ظر , طوري , كور , برين birrîn , kurr , gurî , virr :rr ل : لطلتك , خال , كولى kulli , xall , gellek : ll B- sebarêt tîpên cewî (ç , k , p , t) ku heman dengî didin lê bi du rengan sert û nerm, di baweriya min de tu pêdivî tune ye ku em çar tîpên di li Abc ya Kurdî zêde bikin, çimkî ew tîp heman dengî didin lê bi du şeweyan yê sert û yê nerm, û ev yek nabe sedemek babetkî bo afirandina çar tîpên nû, herçende tu astengî ji hêla derbirinê û tîgîhiştinê dernakevin, çimkî wataya gotinê li gor cihê wê di hevokê de an di tîkîstê de tê nasîn.

Serencam: Ev nerîna min derbarî Abc ya Kurdî a yekbûyî hemû di warê pêşinyarê de ye, em nikarin bi rengekî takekes tu biryaran di vî mijarî de bistînin, çimkî biryardan di vî mijarî de ji erkê

Vekolîn Salar Salih



korê zanyarî ye, lê çareserkirina vî pîrsa teknîkî di zimanê Kurdî de pir girîng e, û dibe gava pêşîn li ser rêka yekîtiya zimanê Kurdî û peydakirina zimanekî stander, min bixwe nexwest ku bikevim warê bijartina formên her sê

tîpên (ع,ع,ع) yên ku pêwîstî bi zêdekirina wan li Abc ya Celadet Bedîrxan heye, çimkî ev mijarekî zanistî û teknolojî ye û bi pêwîstî vekolînek taybet e, lê di baweriya min de çespendina Abc ya Latîni ji 34 tîpan bo

zimanê Kurdî, dî zimanê me ji qonaxekê veguhêze qonaxeke nû wek zimanekî cihanî ku bi yek Abc yê bête nivîsin.

rêz	Abc ya Latîni	Himberî wê di Abc ya Erebi de	rêz	Abc ya Erebi	Himberî wê di Abc ya Latîni de
1	A - a	ا	1	آ	E - e
2	B - b	ب	2	ا	A - a
3	C - c	چ	3	ة	E - e
4	Ç - ç	چ	4	ب	B - b
5	D - d	د	5	ث	P - p
6	E - e	ة , آ	6	ث	T - t
7	Ê - ê	ي	7	ج	C - c
8	F - f	ف	8	ض	Ç - ç
9	G - g	ط	9	ح	-
10	H - h	ه	10	خ	X - x
11	I - i	-	11	د	D - d
12	Î - î	ي	12	ر	R - r
13	J - j	ذ	13	ر	-
14	K - k	ك	14	ز	Z - z
15	L - l	ل	15	ذ	J - j
16	M - m	م	16	س	S - s
17	N - n	ن	17	ش	Ş - ş
18	O - o	و	18	ع	-
19	P - p	ث	19	غ	-
20	Q - q	ق	20	ف	F - f
21	R - r	ر	21	ظ	V - v
22	S - s	س	22	ق	Q - q
23	Ş - ş	ش	23	ك	K - k
24	T - t	ت	24	ط	G - g
25	U - u	و	25	ل	L - l
26	Û - û	وو	26	ل	-
27	V - v	ظ	27	م	M - m
28	W - w	و	28	ن	N - n
29	X - x	خ	29	ه	H - h
30	Y - y	ي	30	و	U - u , W - w
31	Z - z	ز	31	و	O - o
-	-	ح	32	وو	Û - û
-	-	ع	33	ي	Î - î , Y - y
-	-	غ	34	ي	Ê - ê
-	-	ر	-	-	I - i
-	-	ل	-	-	-

Çavkanî: -Elfabeya Kurdî , Celadet Alî Bedîrxan. -Bingehên gramera Kurdmancî ,Celadet Alî Bedîrxan- Rojêh Lisko.

-Rênivîsa zimanê Kurdî ya ABC ya Erebi , Başûrê Kurdistan. -Kovara Hawar, hejmar 9an. -Em Zimanê Kurdî Binasin , Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê. -Feheng (Erebi-Kurdî) , zaravayê

Kurdmancî, amadekirina: D.Cano - M.Şêrgo. -Hinker - asta sêyemîn, Ronayî Onen | Samî Tan, Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê.

Yekem Semîner Di Warê Abûrî De Li Qamişlo Lidar Dikeve



Di roja 23 Sibata 2015an de Dr. Mihemed Şewqî Mihemed «Dektora di aboriyên Petrolê de» semînerê di di bin navê «Buhaya Petrolê Di Navbera Siyaset û Aboriyê De» li hola kongirên li bajarê Qamişlo bi amadebûn hejmare ji rewsênbir û pisporan

û hindek ji kesayetên siyasetî û bi sponseriya rojnameya Bûyerpress lidar xist. Piştî pêşkêşkirina ji hêla mamoste Kewser Reşîd ve, kesên amadebûyî keliyek bêdeng rawestiyân, Dr. Mihemed Şewqî dest bi semînera xwe kir û pêşî

dokumênt filmek li ser Siu'diya Erebi berî û piştî Petrolê pêşkêş kir. Dîv re li ser her çar xalên sereke axivî, pişt re her xalek bi tena xwe şirove kir. Dawî semînar bi hindek pîrs ji hêla mêvanan ve hatin kirin, û Dr. Şewqî bersiva wan da.



Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûryayê di roja cihanî a zimanê dayikê de, çalakîyek çandî li çayxaneya Kobanî li taxa Kornîş û bi amadebûna hejmareke mezin ji nivîskar, helbestvan, û xemxurên zimanê kurdî lidar xist. Çalakîyê bi rawestana keliyek bêdeng destpê kir, dîv re birêz Ehmed Erefat gotinek bi navê saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî da, tîpê de pêwîstiya belavbûna zimanê dayikê û

parastina wî ji wendabûnê tekez kir, ji ber ziman bingeha parastina dirok û çanda gelan e. Herweha helbestvan Konê Reş û birêz Newf Bavê Dara û Ednan Umer gotinek bi navê rêxistina mafê mirovan dan, tîpê de bal kişandin ser girîngiya ziman di jiyana gelan de û dijiwariya ku diroka zimanê Kurdî tîpê re derbas bûye. Helbestvan Hekîm Ehmed, Ebdirchman Ibrahim, û Ahî Eto ji

bajarê Kobanî helbestin xwe gotin. Mamoste Konê Reş bo rojnameya Bûyerpress got: «Em hemû milletê cihanê bi roja binavûnîşan pîroz dikin, spasiya Saziya Fêrbûn û Parastina Zimanê Kurdî li ser vî xebata gewre dikim, ez dibînim ku roja zimanê Kurdî 15ê Nîsanê ye, ji ber di wê rojê de û di sala 1932an de Mîr Celadet Rojnameya Hawar damezirandiyê».

Melîkaenên Navdar Dê Cilên Kurdî Li Xwe Bikin



**DÎÇÊ LÊ FRATNÂŞKÎ
MEZOPOTAMIYA
Yöresel Kıyafet Defîlesî**

*Birayê Dêkên Çerçevîyê
Ozayê Nûçeyê
Sema Şimşekî
Gimnî, Kûbîrî, Dîyayî...
(w)*

Mankenên navdar Tuğçe Kazaz, Tugba Ozay û Sema Şimşek ji bo defîleya 8ê Adarê li Mêrdînê bê lidarxistin, hatin vexwendan. Bi helkefta 8ê Adarê Roja Jinên Cihanê de li Mêrdînê defîleya bi navê "Evîna Dîjîlê û Fîrat: Mezopotamya" bê lidarxistin. Cil û hesincawên ji aliyê 1068 jinên kedkar ve hatin amadekirin de ji aliyê 25 mankenên ve bê pêşkêşkirin. Cilên ereban, doman û kurdên êzîdî de ji aliyê 10 jinên ji wan xelkan ve bê pêşkêşkirin û cilên din ji de ji aliyê 15 mankenên navdar ve bê nişandan. Ji bo defîleya 100 cilên bîn pêşandan çend kesên di aliyê

karsazî, huner, û siyasê de navdar hatine vexwendan. Di nava kesên hatin vexwendandin de komeleyên jinan, Cemil Îpekçi, keça Serokomarê Tirkîyeyê Recep Tayyip Erdogan Sumeyye Erdogan û çend parlamenter ji hene. Organîzatora defîleyê Gulbahar Ormek ji Rûdawê re diyar kir ku wan Tuğçe Kazaz, Tugba Ozay û Sema Şimşek ji bo defîleya 8ê Adarê vexwendine û wiha got: "Em li bendenin ku heta roja inê bersiva me bidin. Heger bersivama erênî bidin ewê çend çilên kurdî li xwe bikin." Rûdaw

Amedsporê Serkeftinek Mezin Bidest Xist!



Stenbol (Rûdaw) – Tîma fûtbolê ya Amedê (Amedspor) di listîka xwe ya çaremîn de li tîma Galatasarayê ya Tirkîyeyê bir. Îşev di çarçoveya listîkên Kûpa Ziraatê ya Tirkîyeyê de, tîma Amedsporê li Yariğeha Turk Telekom Arenayê ya Stenbolê derket hemberî tîma Galatasarayê.

Di dawiyê de Amedsporê bi encama 0-2 li Galatasarayê bir û 3 xal bidest xist. Golên Amedsporê di xulekên 3 û 3+90 en listîkê de ji aliyê Yûsif ve hatin avêtin. Bi vî awayî, xalên Amedsporê bûn 4, yê Galatasarayê jî di 9an de ma

Bi wêne.. Xwedîtî li 2 Hezar û 500 Sewalî Hate Kirin



Li Amedê, di Navenda Rehabîlîtasyon û Xwedankirina Ajalan a bi ser Şaredariya Bajare Mezin ya Amedê de hêrsal bi buhayê 1 milyon û 300 hezar lire tê mezaxtin û bi sedan sewal û heywanên ten sexbêrkirin. Midûrê Şaxa Tendurîstiya Gel û Karên Beyteriyê Muhsin Uyanik, diyar kir ku li vî navenda ku dikare 700 ajalan lê werin ragirtin, xwedî cihazên rontgen, ultrason û unîteya

xwinê heye. Uyanik da zanin ku amûrên xesandinê yê geride bi wan re hene û ger li cihêkî ajalek nexweş an jî seqet bibe ew dikarin demildest xwe bigihînin. Beyter Akin Bozhan jî aşkere kir ku heywanê tê girtin, xesandin, guhar û dirû tê lîxistin, paşî wî berdidime cihê wî û got, "Heta niha 2 hezar 250 ajal jî vî derê hatine hildan û xwedanên wan çêbûne.xenedan"

Heriya Te Hineya Şahiya Bûkan e



Mamik ???
Ew di hundurê malê de, mal di hundurê wê de ye?
Tiştê min ê tiştanî, ne ling heye ne panî, her roj diçe kanî?
Mele ye, mele nîn e, aqilmend e ruh tê nîn e?
Mele ye, mele nîn e, aqilmend e ruh tê nîn e?
Sindoqa tijî têl, deng dide pêl bi pêl?
Destekî çermîn e, bi damar e, bê xwîn e?
Bersiva Hejmara 13an Kolemişk- Baran – Bacana Rey- Eylo- Zebes



Pesnên Dunyayê Li Gorî Ezmûnên Kurdan

Dunya bûye tara bêjîngê
Xwelî li dunya yê be rîto bûye axa
Dunya warê zana ye, ne meydana kera ye
Dunya baqê nivco ye
Dunya deme geh şebeşe geh leme
Dunya xane hin jê çûne, hin lê mane, lê ew jî wê bidin dîw wane
Dunya ji melekê misrê re nema ye

Xwarinên Herî Xirab Ên Cîhanê



Li her welatekî cîhanê hezkirineke xwarinê ya cuda heye. Hinek



Ka em wêneyên xwarinê ku di lî mirov li hev dixe bibînin:

Kurdî Xweş e

Daberbûn	تعرى	Derz	شرع
Dabînkirin	تأمين	Destberî	كفالة
Dabênan	الاختراع	destpeyv	حجارة
Dapoşin	تغطية	Desteser	رهينة
Daxdan	اكتواء	Destpêşî	مبادرة
Demdirêj	تجرتي	Destwerdan	
demdar	مزمن	تخلل	
Derbederkirin		Devera negeyen	
تشرید		منطقة عزلة	
derbesti	التزام		

Zûbêj

Sênika çingo çena çeleng li ber çem çirand

RADYOYA

Dengê Pêşverû

Dengê Azadiyê
Dengê Rûmtê
Dengê Jiyane

Dengê Partiya Dîmoqrati Pêşverû kurdî Li Suriya

QAMISLO

99.0 FM

PÊŞVERÛ
99.0 FM

f Denge Peshveru t Denge Peshveru 052-438760